


Dr. Qasimlo şehîd kirin, lê nav û rêbaza wî, tu carî namirin

»»» R:7



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (306) 21-07-2017 Buha (1000) Tûmen



Kak Mistefa Hicrî: Dr. Qasimlo di hemberî kêmasiyan de bê helwêst nebû, û fikir dikir û rêçare ditîn bo çareseriya kirîzan


»»» R:3

Ez sê rojên bi Qasimlo ra li buhuştê bûm…

»»» R:6



Şehîd Dr. Qasimlo tu carî nahê jibîrkirin



Bi boneya 22`ê Pûşperê 28.mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî, gellek çalakî bi rê ve çûn.

Piştînîvroya roja Pêncşemiyê 22`ê Pûşperê, Bi boneya 22`ê Pûşperê 28.mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî bi beşdariya Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ, rêberayetî, kadr û pêşmerge, malbatên wan, û çendîn alî û hizbên siyasî û mêhvanên beşdar, rêûresmek bi rê ve çû. Di vê merasimê de piştî xwendina sirûda “Ey Reqîb” û ragirtina deqeyekê bêdengî bo rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên hizb û gel, Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ axavtinek kir.

Navbirî di beşeke axavtina xwe de ragehand: “Di meha Pûşperê de rûdawên din jî hebûn, wekî şehîdbûna Seyîd Selam Ezîzî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ, û şehîdkirina desteyek ji pêşmergeyên PDKÎ di encama xebata nû ya Rasanê de”.

Hicrî di beşeke axavtina xwe de got: “Pîlana terorkirina Dr. Qasimlo pîlanek e ku ji bilî Îraniyan gellek kêm hebûye ku aliyek, bi armanca jinavbirina aliyekî din, maseya diyalogê bi kar bîne”. Herweha navbirî bas ji pêdagiriya gelê Kurd li ser xebatê piştî derbazbûna 28 salan bi ser şehîdkirina Dr. Qasimlo re kir.

Di naveroka merasimê de, peyama rêkxirawên jinan, Lawan, Xwendekaran, û çend helbest û sirûdên taybet bi vê boneyê hatin pêşkêşkirin. Çendîn hizb û partî û aliyên siyasî jî bi boneya 28.mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo peyamên taybet bi vê rojê ji PDKÎ re şandibûn.

Herwisa di gellek ji welatên derve de jî, rêûresmên taybet bi 22`ê Pûşper û gellek semînar bi rê ve çûn. Di navxwe ya Kurdistanê de jî, rêvîngên rê û şopa Dr. Qasimlo bi her awayekî ku ji destên wan hat, di piraniya gund û bajarên Rojhilata Kurdistanê de, rêz ji şehîdên 22`ê Pûşperê girtin, û selimandin ku serbarê rewşa tund ya ewlehiyê jî, ew dikarin rêberê xwe yê gernas û leheng bi bîr bînin.

Bi vî awayî cardin gelê Kurd bi taybetî di Rojhilata Kurdistanê de selimand ku heya Kurdek mabe, Demokrat her dimîne û mafê Kurdan distîne, û rêbaza Qasimlo jî tu carî nahê jibîrkirin.



Jiyan û serpêhatiya şehîdên nû ên Rasanê di destanrêsiyên Qereseqel û Kosalanê de

»»» R:8

Sergotar

Çala lawaz ya Komara Îslamî

Kerîm Perwîzî

Rejîma Îslamiya Tehranê, piştî zêdetir ji 38 salan serberedayîtî û tawankariyan, heyamekê îdia dikir ku çavkanî û xala girîng ya ewlekariya navçeya Rojhilata Navîn e.

Vê rejîmê ku her di destpêka bidestvegirtina deshilatê de, diruşma şandina derve ya şoreşê û di rastî de, pîlana pêkanîna tevdanîkariyan di navçeya Rojhilata Navîn de hebûye, nêzî sê dehikan dibe, ku bi tewahiya hêz û şiyana xwe, girûpên terorîstî dişandin derve, û di welatên navçeyê de jî, girûpên tundajo û terorîst û şarlatan bihêz kirine, û organize kirine, da ku tawan biafirînin, û li ser erdê, mana xwe di têkdana ewlehiyê de bibînin.
Di van salên dawiyê de, ku girûpên terorîstî ên cur bi cur wekî karkaroka bijehr di hemû cihekî de serî hildane, û Komara Îslamî jî bi hemiyan re ketiye nava têkiliyan de, û carekê bi navê dijberiya digel wê, û carekê jî di pêwendiya siyasî de! digel ên din, xwestine ku rûçikê navçeyê pirr ajawe nîşan bidin, û digel wan rêk ketine, ku tu yek ji wan di nava Îranê de kiryarên pirr ajawe encam nedin, da ku Komara Îslamî wekî cihekî aram di nava Rojhilata Navîn de xûya bike. Ew siyaseta pilandarêtî ya rejîmê yek lawaziyeke girîng û bingehîn heye, ku rejîmê bîr jê nekiriye, ku di rastî de ew jî ne tenê xala lawaz belkû çala lawaz ya rejîmê ye.
Ya ku rejîma Îranê hisab jê re nekiribû, û dixwest ku wekî hemû carê bîr bike, û dunya jî piştî wê, ji bîr bike, faktorek bû bi navê neteweyên zulmlêkirî, di Îranê de. Komara Îslamî ya Îranê ku bi serkut û îdam û îşkenceyê, çalak û mafxwazên rasteqîne, yên van neteweyên bi qewlê xwe, di meydanê de, derxistibûn, da ku bi çêkirina hinek girûp û kesên kartonî, wan wekî nûnerê xebata van neteweyan nîşan bide, bi van pîlanên xwe wisa dizanî, ku pirsek bi navê pirsa neteweyî di Îranê de tune ye, û bi taybetîtir ew li ser vê hizrê bû, ku pirsa Kurd bo hertim bêdeng kiriye, û bi hinek pîlanan di navxwe de ji rê derxistiye.
Siyaseta bêdengkirinê di navxwe ya welat, û tevdanîkarî di derdorê, û girnijîn û kenî li Ewropa, sê biyavên stratejî ya Komara Îslamî bûn, ku bi hebûna pêşmergê Kurdistanê, di nav dilê xelkê de, wekî pifdana zilameke navbetal teqiya, û niha rejîma Îranê maye û dunyayek kêşeyên navxweyî û ewlekarî û şerê bandên di nav wan bixwe de, û Kurdistan wekî hertim bûye kabûsa jiyana rejîma terorîst a Tehranê!.
Belgeya herî nû jî bo vê gotinê, ew nivîsa Keyhan a Tehranê ye, ku di beyta rêberî ya rejîmê de tê amadekirin. Di vê nivîsê de, ku roja 27`ê Pûşperê bi pênûsa Se`idullah Ra`î belav bûye, nivîsandiye:
"Di van civînan de, ku di van dawiyane de di Îranê de hatine girtin, ew encama jê hatiye wergirtin, ku xala gefa ewlehiyê li ser Îranê navçeya bakûra Rojava ye".
Bi zimaneke sade dibêje ku di beyta rêber de civîn hate lidarxistin û gihîştin vê encamê, ku wekî hertim Kurdistan gef e li ser rejîma Wilayeta Feqîh. Hebûna pêşmergê Kurdistanê, kabûs e li ser jiyana serberedayî û terorîstan.

Çend kesayetî û rewşenbîrên Kurdistanê, serdana Deftera Siyasî ya PDKÎ kirin



Komeke kesayetî û ronakbîrên Kurdistanê û endamên desteya avakerê Tevgera Aştiya Navxweyî a Kurdistanê serdana Deftera Siyasî ya PDKÎ kirin.

Roja Yekşemiyê 19`ê Pûşperê komeke kesayetî û ronakbîrên Kurdistanê, û endamên desteya avakerê Tevgera Aştiya Navxweyî a Kurdistanê serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kirin, û ji aliyê heyeteke PDKÎ ve bi serperestiya Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ ve pêşwazê ji wan hate kirin.

Di vê serdanê de Dr. Mûsa Keval ji aliyê wan kesayetiyên siyasî û ronakbîr û welatparêzan ve, bas ji armanca xwe ji vê serdanê kir, û got ku me ew pirsa heye, ku gelo çima di Rojhilata Navîn de, Fars, Ereb û Tirk xwedî dewlet in, û Kurd heya niha nebûye xwedî dewlet? Piştî şiroveya vê behsê, dibe em bîr ji vê bikin, ku çawa bibin dewlet.

Dr. Mûsa Keval îşare bi vê kir, ku digel hizb û aliyên siyasî ên he rçar beşên Kurdistanê, di diyalogê de ne, û bi vê boçûnê ve, heya ku Kurd yekît û yekrêziya xwe tunebe, nikare bigihêje vê armancê, û daxwaza me ew e ku, hizb alîkar bin ji me re.

Piştre Hesen Şerefî tevî bixêrhatinkirina wan îşare bi vê kirin, ku tevgera we, erkeke pîroz û giran heye, û boçûna PDKÎ di vê derheqê de bas kir, û piştevaniya hizbê ji tevgera wan ragehand û hêvî bo wan xwast ku di vê erka neteweyî û nîştimanî de serkevtî bin, û spasiya vê serdanê kir. Tevgera Aştiyê a Navxweyî a Kurdistanê pêk hatibû ji rêzdaran:

Dr.Mûsa Keval, serokê tevgerê, Elî Feylî, Dr. Qadir, Maosta Ebdulwahid Sînemxan, Mamosta Xelîl, Se`id Şêx Biznî, Dr. Îzedîn

Bazên Zagrosê xwefiroşek ceza kirin

Bazên Zagrosê di operasiyonekê de xwefiroşeke ser bi rejîmê ceza kirin.



Wêblaga Bazên Zagrosê di rapora xwe de belav kiriye, ku vê kirêgirtiyê rejîmê pileya sotwanê yekem di gelfiroşiyê de hebûye.

Herwisa Bazên Zagrosê di vê raporê de belav kiriye, ku ew kirêgirtiya piştî pênc caran hişyarkirinê, dîsan jî amade nebûye ku dev ji îxanetê berde, û lewra jî gihaye cezaya îxaneta xwe.

Navbirî kurê Tofiq xelkê bajarokê Dizeya Mirgewer a ser bi bajar Urmiyê bûye, û di hember xwefiroşiyên xwe de, buhara îsal pileya leşkerî ya stwanê yekem pê tê dayîn.

Bazên Zagrosê belav kirine ku ew hêza çekdar, xwe palpiştê tevgera rewa ya xelkê Kurdistanê dizanin, û piştevaniyê ji xelkê hejar û zehmetkêş û kasibkar dikin, û nahêlin ku tawankariyên hêzên dagîrkar ên Kurdistanê bê bersiv bimînin.

Deqa axavtina kak Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ di rêûresma 22`ê Pûşperê, 28.mîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî de



Kak Mistefa Hicrî: Dr. Qasimlo di hemberî kêmasiyan de bê helwêst nebû, û fikir dikir û rêçare ditîn bo çareseriya kirîzan

Hevalên xoşewîst, xûşk û birayên birêz û mêhvanên hêja!

Silaveke germ li we be, û bi xêr bên, bo merasima bîranîna desteyek ji şehîdên Kurdistanê, ku di riya rizgariya niştimana xwe de jiyana xwe ji dest dan. Di sala 1368`an de, Dr. Qasimlo digel Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî û nûner PDKÎ li Fransayê, digel Fazil Resûl di civînekê de li Viyenê, ku biryar bû bi armanca gotûbêjkirin bo dîtina rêçareyke aştîxwazane bo pirsa Kurd di Rojhilata Kurdistanê de pêk bê, çûbûne wir, lê bi destê kirêgirtiyên rejîma Îranê hatin şehîdkirin.
Ji wê demê ve heya niha hemû salekê em di civîna û semînaran de yad û bîreweriya wan şehîdan bilind radigrin. Pêwîst e ku ez vê yekê jî bas bikim ku di rastî de çi roj û mehek di salê de nine, ku komeke têkoşerên me di berberekaniya digel hêzên rejîma Tehranê de, jiyana xwe di riya nîştimana xwe de ji dest nedabin. Meha Pûşperê jî her yek ji wan mehan e. Li ser îzna we, berî vê ku ez çend gotinan li ser mezinahî û bandora Dr. Qasimlo di PDKÎ de bas bikim, ezê awirekê li şehîdên Pûşperê bidim. Li 24`ê Pûşpera sala 1378`an de hevalê têkoşer Seyîd Selam Ezîzî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ bi nexweşiyeke ji nişkêve li riya nîştiman û hizba xwe de şehîd bû, ku navbirî yek ji endamên rêberatiya PDKÎ bû ku her piştî destpêkirina cardin ya xebatê piştî rejîma paşatiyê, tevlî refên PDKÎ bû, û heya dema şehîdbûnê jî, bê rawestiyan bo ber bi pêşvebirina karûbarên hizbê kar û fedakarî kir.
Xeynî vê yekê, di meha Pûşpera par de desteyek ji pêşmerge û kadrên me ên têkoşer, di xebatekê de, ku li Rojhilat bi xebata Rasana Rojhilat bi nav kirine, li gellek ciyan û li kûrahiya welat de canê xwe ji dest dan. Rijiyana xwîna van şehîdên me, xwîneke nû di nava demarên tevgera Rojhilata Kurdistanê de xiste hereketê, ku heya niha jî ew hereket di nava kadr û pêşmerge û hemû welatparêzên Kurd li her beşeke Kurdistanê de bandora wê diyar e.

Em li vir kom bûne da ku cardin emegdariya xwe nîşanî hemû fedakarî û qehremanetiya wan niştimanperweran bikin, ku di riya azadiya gel û hizba xwe de jiyana xwe gorî kirin. Silav li canê pak ê wan û malbatên wan.

Derheq şehîdkirina Dr. Qasimlo de, di vê heyamê de, gellek mijar û pertûk hatine nivîsandin, û gellek kesayetiyên siyasî û ayînî û niştimanperwer li ser axivîne, û di cihê xwe de ye ku heta zêdetir jî li ser qise bê kirin, lê niha ku dem nine, ez dixwazim ku li ser yek ji taybetmendiyên wî qise bikim ku kêmtir bas lê hatiye kirin, û her bixwe jî cihê jê fêrbûnê ye, her wekî ku hûn bixwe dizanin ku tekoşîna siyasî ya Dr. Qasimlo ji wê demê ve ku ciwanek bû di partiya Tûde de dest pê kir ku di salên 40`î de di Îranê de pêk hat, û hizbeke pêşkevtî bû, û karî hêzeke mezin ji Îraniyan li dewra xwe kom bike. Dr. Qasimlo karê xwe yê siyasî di vê hizbê de dest pê kir. Wê demê ew baweriya ku di nava Îranê de hebû, zêdetir ew bû ku ew hizba ye ku dikare hejaran û kedkaran û netewêyean li jêr destê koletiyê rizgar bike. Dr. Qasimlo jî her bi vê niyetê ve di wir dest bi tekoşînê kir, ji Yekîtiya lawan de dest pê kir û li heyama 10 salan de karî bibe kadrekî naskirî ê wê hizbê, lê ew kêşeyên ku di hizba Tûde de dest pê kirin, û çarenûsa gelê Kurd tê de tarî bû, û girêdayî bi Soviyetê bû, bi taybetî di dema kûdetayê de, ku hemû xelk çavnihêr bûn ku Dr. Musediq hikûmeteke gelî û demeokrat pêk bîne, lê piştgiriya Soviyetê û hizba Tûde li jêr bandora Soviyetê de, bû sedema vê ku kûdeta şikestê bixwe, û hejmarek ji Tûdeyiyan di arteşê de bêne îdamkirin. Gellek bûyer rû dan, û piştre Dr. Qasimlo çû Çikisliwakiyê. Êrîşa arteşa Sor û têkdana buhara Piragê bandoreke wisa li ser Dr. Qasimlo hebûn. Dr. Qasimlo ku hez ji azadî û demokrasiya gelan dikir, lê dema ku dît di şeveke dê hêzên Soviyetê ji tankên xwe hatin xwar û buhara Piragê têk dan, bandor li wî kir. Ew yek hemû, cihê pirsyarê bûn bo Dr. Qasimlo. Lewra Dr. Qasimlo hate ser vê baweriyê ku rêbaza xwe ji Tûde cuda bike, ku niha tenê digel çend kes ji endamên PDKÎ ku piştî rûxana Komarê ji hev dûr ketibûn, hewl da ku hizbeke neteweyî û demokrat û pêşkevtî û serbixwe ava bikin, li wir ve kar û tekoşîna wan di hizba Demokrat de dest pê dike. Di buhara sala 1953`an de rasterast ji teşkîlata hizba Demokrat de beşdar kiriye. Ji wê demê ve heya şehîdbûnê, Dr. Qasimlo yek ji rêberên herî bibandor û xwedî hizr û bîr ê Hizba Demokrtat bûye. Yek ji taybetmnendiyên Dr. Qasimlo ew bû ku hewl dida ku hizba wî sertopê xebat û tekoşînê li Rojhilata Kurdistanê de be, wî hertim bîr ji vê dikir ku tiştên nû ava bike, di kirîzan de bîr û hizra wî bû ku PDKÎ dibire pêş. Ew li hizra paşeroja hizab xwe û civaka xwe de bû.

Bîr ji vê dikir ku çi bike ku hizba wê sertop û xûya be, û razî nebû bi ya ku heye. Lewra Dr. Qasimlo Hizba Demokrat dike hizbeke pêşkewtinxwaz, û serbixwe, û vê yekê bi awayekî nû di siyaset û nav hizbê de cîbicî dike, û bi danîna bername û peyreweke nû di wê serdemê de, di nava PDKÎ du boçûn li dijî hevdu hebûn, yek nasyonalîzma tenghizr bû ku ji bilî Kurd çi tişteke din nedixwast, û aliyekî din paşmayiya fikra Tûdeyî bû û dixwast Soviyet çi dibêje ew yek bê cîbicîkirin, û Dr. Qasimlo hewl da ku bandorê danê ser vê şaşiyê, û zêdetir ji deh salan bo vê yekê kar kir, û di encam de kurte basek li ser sosyalîzmê anî berbas, û di kongireya şeş de da pesendkirin, bona vê ku hizba Demokrat ji rasta Îfratî ve heya çepa Tûdeyî bike hizbeke demokrat ku li ser piyê xwe bisekine, û di pêxema azadî û demokrasiyê ya gelê xwe de kar bike, ew xebata ku Dr. Qasimlo dest pê kir, xebateke teorî-siyasî bû, û gellek neyar li nav Hizba Demokrat de li dijî xwe çê kirin, hinek ser vê baweriyê bûn ku Hizba Demokrat dev ji sosyalîzmê berdaye, û ber bi rast ve diçe, ji aliyê din ve hilgirên fikra nasyonalîzma tenghizr fikir dikirin ku Dr. Qasimlo li biyavê fikra Tûdeyiyan de kar dike, heya di kongireyekê de ku sosyalîzma demokratîk hate pesendkirin, tenê bi cudahiya yek-du dengan hate pesendkirin, û piştre jî bi dehan kesî ji kadr û pêşmergeyan ku fikir dikirin sosyaîzm Hizba Demokrat ji rêya xwe dûr dixe, hizba me bi cih hêlan. Heya piştre navbirî lîsta fiks anî gorê, ku ew jî bû kêşeyeke din, û kirîzeke din çê kir, lê Dr. Qasimlo bawerî bi vê yekê hebû, û ew yek gehande pesendê.
Di vir de ez dixwazim ku vê yekê

bêjim, dema ku Dr. Qasimlo digihîşte vê qena`etê ku bo berberekaniya digel rastrewî û çeprewiyê îdeyên nû û mîkanîzmeke nû bîne gorê, hemû şiyana xwe bi kar dianî û ji karşikêniyan û tohmetan neditirsiya. Li wir de naxwazim ba sji vê bikim ku gelo hemû ew karê ku wî ji bona rohnîkirina pêşeroja Kurd dikrin, çiqas serkevtî bûn, yan ne. Lê Dr. Qasimlo di hemberî kêmasiyan de bê helwêst nebû, û fikir dikir û rêçare ditîn bo çareseriya kirîzan û hewl da nerohniyan di nava Hizba Demokrat de rohn û zelal bike. Heya dixwazim ku vê yekê bêjim ku qebûlkirina gotûbêjê digel rejîma Îranê li pêxema vê pirsê de bû. Niha hekî kêmtirxemî di gotûbêjê de hebûye, eva pirseke din e, û eva girîngiya vê pirsê kêm nake, lê wî bo rohnkirina pêşeroja gelê Kurd û Hizba Demokrat pê danî vê qadê de. Lê Rejîma Îranê ji vê niyeta pak mifaha xirap wergirt. Rejîmek ku tu wefa bo tu tiştî nine. Bala xwe bidnê, ku ji bilî Îraniyan di mêjûya Îraniyan de, kêm heye ku du alî bo jinavbirina hev, ji maseya gotûbêjan mifahê wergirin, û Dr. Qasimlo di vê meydanê de feda bû. Di warê dijminatîkirina digel gelê Kurd û wêrankariyan, me gellek tişt li ser cinayetên Sedam dîtine. Heta sedam Husên di civîna gotûbêjan de, qet ji vê pîlana qirêj mifah wernegirtiye. Çengîz Çandar ku yek ji rojnamevan û siyasetvanên naskirî, û dostê Kurdan e, li pirtûka xwe ya bi navê “Şemendefera Mezopotamiya” bas ji rûdawekê dike ku vê gotina min piştras dike, ew bas ji vê dike ku dema Sedam rûxa, Noşîrwan wekî nûnerê YNK`ê di meclisa hukim de beşdar dibe, û Çandar gel hin ji hevalên xwe bo heyama çend rojan li wir dimînin wekî mêhvanê Noşîrwan. Ew bas ji vê dike ku, Noşîrwan gotiye wî, ku ew apartoman û ew ode bixwe dîrokek taybetî heye. Di sala 1984`an de dema ku bo yekem car heyeta YNK`ê hatibû bo gotûbêja digel Sedam Husên, û em nêzî lihevkirinê bibûn, rojekê Sedam Husên hat, û her li ser vê kursiyê ku tu li ser rûniştî yî, rûnişt, û rû li me kir û got, gelî hevalan ez daxwaza lêborînê ji we dikim ku êdî ji vê zêdetir ez nikarim digel we gotûbêjê bikim, jiber ku Turk hatine û gotine me, hekî hûn van gotûbêjan bigehînin encamê, em nikarin qebûl bikin, hekî vî karî bikin, emê boriyên petrolê ku diçin bo Yûmûrtalikê, emê wan qut bikin, Sedam Husên got, gelî birayan, em nikarin şerê Tirkan bikim, lewra em neçar in ku gotûbêjên xwe li vir bi dawî bînin, piştre Sedam her li wir biryar da, ku çendîn kes ji karmendên Îstixbaratê digel heyeyta Kurdan wan hevrêtî bikin heya ku herêma li jêr deshilata wan, bi cih bihêlin.

Noşîrwan piştre got ku em çûne cihê xwe, û agirbes bi dawî hat, û me şer dest pê kir, û eva şêweya reftara Sedam bû digel heyeta Kurdan ku bi salan bû bi hev re şer kiribûn, û bi hezaran kesî ji hevdu kuştibûn.

Di gotûbêjekê de ku bi navbeynkariya Dr. Qasimlo, di navbera Mam celal û Sedam de pêk hat, û heyeta YNK çû Bexdayê, Dr. Qasimlo gote me, ku Mam Celal gote min, gelo ku em diçin Bexdayê bo gotûbêjê, û ez jî bi xwe gel wî dibim, gelo çi zemanetek heye ku em diçin Bexdayê?. Dr. Qasimlo vê pirsyarê ji Sedam Husên dike, û Sedam dibêje Dr. Qasimlo, ku bêje wan, Sedam Husên zamin e. eva bû ku me dît çendîn carî heyetên Kurd û bi taybetî YNK çûne Bexdayê û bi silametî jî vegeriyan.
Ew yek mînak in, dema tu didî berhev, û bas ji exlaq û şêweya kar heta di navbera dîktatoran de dikî, dibînî ku rejîma Îranê heya çi qasî bê exlaq û nizm û bê pirensîp e. Lê niha piştî derbazbûna 28 salan, ku bi ser şehîdkirina Dr. Qasimlo re derbaz dibe, û wan jêve bû ku bi şeîdkirina wî xebata Kurd di Rojhilata Kurdistana Îranê de bêdeng dibe, û hewl dida ku şoreşa Kurd di hemû beşan de rastî şikestê bê, lê em niha şahidê qonaxeke nû û serdemek nû, û pêşveçûneke nû di xebata Kurd di her çar beşên Kurdistanê de ne. Sebarê vê ku dîktatorên wekî Sedam û Pehlewî û Komara Îslamî, me ceribandine. Niha li Bakûr û li Rojava de Kurd germ û gurr e, li Rojhilat xebat bi awayê xwe berdewam e, û li Başûr ku piştî rûxana Sedam Husên Kurdan deshilateke xwecihî ji xwe re ava kirin, lê sebarê hemû dijayetiya rejîma Îranê û neyarên Kurd, niha amadekariyan dikin, ku xelk bixwe qedera xwe diyarî bike ku gelo dixwaze serbixwe be yan gel Îraqê bimîne, û eva mezintirîn kêşeya Komara Îslamiya Îranê ye, û ji hemû neyarên din zêdetir digel vê fikrê û vê hereketê dijayetiyan dike, lê Komara Îslamî ya Îranê digel vê ku hemû van pîlanan bi kar aniye, û dixwaze ku wisa nîşan bide ku qehremaneke serkevtî ye, û di hemû Rojhilata Navîn de dikare ku deshilat û nifûza xwe vegeşîne, lê rastiya wê, ew e ku di beşek zaf ji welatên Rojhilata Navîn de, ji xwe re qofiyek saz kiriye, ku bixwe tê de maye, û mijûl e di nav de hereketa mirinê dike, rejîmek ku xelkê Îranê di destpêkê de, û hemû xelkê cîhanî jî dixwastin ku ew rejîmek be, ku bikare vegere himbêza cîhana pêşkevtî, û bikare ji xelkê xwe re jiyaneke baş çê bike, lê niha ew rejîmeke din e bi bawera xelkê. Hekî li ser vê baweriyê bû, ku dikare piştî lihevkirina became, ji xelkê xwe re ewlehiyê dabîn bike, lê niha fikr û



Kak Mistefa Hicrî: Ji bilî Îraniyan, kêm heye ku du alî bona jinavbirina hevdu ji maseya gotûbêjan mifahê bistînin

boçûneke din di nava Rojavayiyan de heye.

Ez ji we re bas ji pirsekê bikim ku pêwendiya wê bi vê pirsê ve heye, hemû carê ku min serdana balyozxaneya Amerîkayê dikir, li balyozxaneya Birîtanyayê, min digel berpirsa beşa Rojhilata Navîn hevdîtin pêk dianî. Jineke siyasî û têgihîştê bû. Çendîn demjimêran me bi hev re qise dikir, û wê demê dewleta Obama bû. Wê jî berdewam bas ji vê dikir ku em naxwazin ku destêwerdanê di nava karûbarên welatên din de bikin û hewl bo guherîna Komara Îslamî bidin, wê digot ku em dixwazin siyaseta wê biguherin, ne rejîmê bixwe. Lê min digotê ku tu kesek nikare siyaseta rejîmê biguhere. Belkû eva ew bûn ku li ser vê baweriyê bûn ku siyaseta wan ew qas rast e ku hemû dunya dibe bê ser siyaseta wan. Cara dawiyê ku ez çûme wir, ew hatibû ber derî bona pêşwaziya ji min, û her berî halpirsînê, got gelo tu niha jî her bîr ji guherîna rejîmê dikî, min jî gotê, belê ez her niha jî dixwazim ku rejîma Îranê biguherim, û her rojekê hûnê jî bêne ser vê baweriyê, lê ew roj wê gellek dereng be, û em her du alî jî, emê nirxeke zaf jê re bidin.
Gelo niha rewş çawa ye, niha Wezîrê Karê Derve ê Amerîkayê bi eşkere bas ji guherîna sîstema rejîma Îranê dike, û rejîma Îranê ku li ser vê baweriyê bû ku dikare cîhanê bixapîne, û xwe bi qurbaniyê destê terorîzm û DAÎŞ`ê bi nav bike, û bo vê yekê gellek pîlan saz kirin, lê niha rejîma Îranê wekî hikûmeteke terorîst û girîngtirîn alîkarê terorîzmê tê nasîn. Di rastî de niha ew xelkê ku mafê xwe nasîne, û amade ne ku jê re nirxê bidin, herçend giran jî be ew nirx, kes nikare wê bixe qedeman. Niha rejîma Îranê metirsîdartirîn dijminê Kurd û dijminê cihgirbûna aştiyê di navçê de ye, û niha yek ji leyîzên mezin ên Îranê ew e ku DAÎŞ niha lawaz bûye û hêdî-hêdî ber bi lawaziyê ve diçe, vê rejîmê li jêr siya DAÎŞ`ê de karî ku bi vî rengî nifûza xwe zêde bike. Rejîma Îranê heya emeg bo nêzîktirîn hevalên Xomêynî jî nebûye, û vê yekê em bi çavên xwe

Sekreterê giştî ê PDKÎ mêhvandariya malbatên şehîdên nû ên Rasanê kir

Desteyek din ji xortên Demokrat tevlî refa serwerên dîrokê bûn.

Piştî şer û pevçûnên di navbera pêşmergeyên PDKÎ û dijîgeliyên Komara Îslamî di destanrêsiya Qereseqel û Kosalanê de, ku sala borî rû da, desteyek ji pêşmergeyên PDKÎ çarenûsa wan nexûya bû, mixabin piştî şopandineke bi hûrî û çavnihêriyeke zaf ya PDKÎ û xelkê navçeyê, û endamên teşkîlata navxwe, tu şûnpiyek ji wan hevçeperên me nehate dîtin, û eşkere bû ku ew hevalên me di nava agirê kerb û kîn û bêrehmane ên dijminan de şehîd bûne.



Ew hevalên ku eşkere bûye ku di şerê li djî tarîperestiyê de şehîd bûne, ew in: Şehîdan Bêhzad Pîrotî kurê Husên di destanrêsiya Qereseqelê de şehîd bûye, şehîd Elî Mehmûdî naskirî bi Şemal kurê Kerîm di destanrêsiya Qereseqelê de şehîd bûye, û herwisa Şehîdan Mêhdî Şêxî kurê Hemexan, Efşar Sûre Bûme kurê Mehmûd, Barzan Husênî kurê Osman, Ruhullah Heyderî kurê Mihemed, Sahib Husênî kurê Ezîz, û Hîwa Qurbanî kurê Hesen.



Îro Duşemiyê 24`ê Pûşperê sekreterê giştî ê PDKÎ mêhvandariya malbatên serbilind ên wan şehîdan kir, û tevî eşkerekirina mixabiniya xwe û PDKÎ derheq şehîdbûna xortên emegdar ên hizbê, ew xatircem kirin ku rêbaza wan heya ser dirêjî dibe, û rêvîngên riya wan, ji caran bigurrtir, ji bo bidetsveanîna armancên şehîdan, wê xizmeta gel û nîştiman bikin.


Roja 26`ê Cozerdana 1395`an hêzên dijîgelî ên rejîmê bi çavsaxiya taqmeke xwefiroşên qirêjxwar, gundê Qereseqel a Şinoyê dorpêç kirin, ku desteyek ji dersxwanên rasteqîne ên serdarê demokrasiyê di nava xwe de dihewandin. Wan egîdên Kurdistanê, agir berdane cendekê dijminên azadiyê, û stûnên lawaz ên spaha tarîperest xistin lerzînê, û wekî qehremanên xebata çekdarî a sala 1346-1347`an, ku girava aram ya Mihemedriza şah hejandin, wan jî hemaseya Qereseqelê afirandin, û bi rasana çiya, ava mend ya Tehranê şilqandin.

Herwisa roja 5`ê Pûşpera sala 1395`an, di demekê de ku hêşta birîna kûr ya şehîdbûna şeş pêşmergeyan li Şinoya serbilind necebirîbû, cardin nûçeyeke dilêş hate belavkirin, û pêşmergeyên PDKÎ piştî afirandina destanrêsiya jibîrnekirî a Kosalan canê xwe kirin goriyê azadiyê.

---

dibînin.
Lewra em li ser vê baweriyê ne, ku rejîma Îranê serwe dixwaze xwe bihêz nîşan bide, lê di navxwe ya welat de, bi bawera xelkê Îranê di rewşa herî xirap de ye, û xelkê Îranê nefret ji vê rejîmê heye. Xelk dibîne ku nanê ser sifreya wan dike xercê kirîna çek û fîşek û bombeyan, û xelkê bê tawan ê Sûriye û Yemen û …hwd pê dikuje.
Em li ser vê baweriyê ne ku rejîma Îranê jî wekî rejîmên din ên herêmê herçend ku jêsta şiyan û hêzê bi xwe ve bigre, lê bê guman hêdî-hêdî ber bi jinavçûnê ve diçe, rejîmek ku êdî di hemberî xwesteka xelkê xwe de nikare xwe ragire, û ew yek meztirîn tirsa Komara Îslamiya Îranê ye, û meztirîn dijminatiyê digel xelkê xwe dike, ji bilî siyaseta navçeyî ku em hemû niha dibînin.
Ez hêvîdar im ku em Kurdên Rojhilat û Kurd di hemû beşên Kurdistanê de, em hemû bikarin ji vê derfeta baş ku hatiye pêş, bi nasîna dirust ya dost û dijminên xwe, bi mifahwergirtina ji van guherînên kûr û berfireh ku di navçeyê de têne pêş, di berjewendiya gel û nîştimana xwe de bi kar bînin, ku ruha şhîdên me şad be, û malbatên şehîdên me pê serbilkin bin, û em jî şanaziyê bikin bi vê ku di vê yekgirtinê de, me jî beşek heye. Carek din silavan dişînim bo riha pak ya şehîdên Pûşper û bi taybetî şehîdê serbilin û dîplomatkarê naskirî û têgihîştî û pêgihîştê ê Kurdistanê, silav li hemû şehîdên Kurdistanê.

Ez sê rojên bi Qasimlo ra li buhuştê bûm…





Têmûrê Xelîl

Bira hêzeke esmanî behsa serxwebûna Kurdistanê bigihîne Qasimloyê ezîz!

Berî 28 salan lehengê gelê Kurdistanê Dr. Qasimlo û hevalên wî bi destê rêjîma hov a Îranê şehîd bûn. Ev nivîsa min derheqa hevdîtina min bi Qasimlo û xanima wî ra ne, ku sala 1974`an li Pragê bû.

Berî çend salan, di şahîya 25 salîya pîrozkirina Înstîtûta Kurdî ya Parîsê da, camêrekî ji Kurdistana Îranê bi navê Abdullahî ber bi min hat û got: “ Xanimek dibêje, ku reng û rûyên te bi wê ra gelekî nas e, lê ne di bîra wê da ye ka we li ku hev dîtîye ”.
Min jê pirsî, navê wê çi ye, got navê wê Nesrîn e.
Min tu xanimeke bi navê Nesrîn nas nedikir.
Ez nêzîkî wê bûm û min destên xwe danê, min dît ku ew “ Hêlên ” a xanima Ebdurehman Qasimlo ye, ku bi kurdî jê ra dibêjin “ Nesrîn ”, û me berî 35 salan, sala 197`4an li Pragê hev dîtibû.
Me hevdu demeke dirêj hembêz kir û te qey digot hesreta 35 salan ji hev hildida… Evê hevdîtina bi wê xanima delal ra ez 35 salan ber bi xortanîya min paşda birim… Min lezeteke baş ji wan bîranînan dît û bi hêvî me hûn jî bibînin.

Sala 1974`an bû, û ez nû zewicîbûm. Min dixwest bi xanima xwe ra derkevim welatekî Ewrupayê seyranê. Lê ji ber ku wan salan gera ber bi Ewrupayê ji bo bineciyên Sovyeta berê hema bêje qedexe bû, lê dîsa jî hinek rê hebûn di komikeke tûrîstîyê da herine welatên sosyalîstî yên li Ewrupayê û em li wan riyan gerîyan.
Ji ber ku bavê min û diya min sala 1971`ê bi vexwendina serokatiya kovara “Problêmên aştiyê û sosyalîzmê” çûbûne Çêkoslovakîyayê, û li wir hinek kurd dîtibûn, wek xudanê miqamê sirûda kurdî “Ey Reqîb” Qadir Dîlan û yên din, me jî biryar kir herine wî welatî.
Em ketine nava komeke tûrîstîyê ya gencan, me berê xwe da Çêkoslovakîyayê û bajarê pêşin, ku em lê hêwirîn, paytextê Slovakîyayê – Bratîslava bû. Çimkî koma me ya gencan bû, em nebirine mêvanxaneyê, lê di xaniyên xwendkarên welatên dereke da bi cî kirin. Min ji reng û rûyê kesên wî xaniyî diman texmîn kir, ku li vir gereke kurd jî hebin.

Îdî şev bû. Ez berjêrî hewşê bûm, min dît xortek û keçek rûniştine, ketine sohbetê. Nizanim çima, min got qey ew ereb e.
Min biryar kir ez nêzîkî wî bibim, pirsa kurdan jê bikim, ka li vî xanîyî kurd hene, an na? Îcar ne ez erebî û çêkî zanim, ne jî ew ermenî û rûsî zane.
Min hema yekser jê pirsî:
-Ereb?
Ewî bersîva min da, got:
-Ereb!
Min jê pirsî:
-Kurd, kurd, ekrad?
Got:
- Ez kurd im!

Wek dibêjin, bîna min ber min da hat, me hinekî sohbet kir, paşê gote min, ku li wî xanîyî 17 kurd hene û Komela xwendkarên Kurd li Çêkoslovakîyayê jî li wir e.
Hema wê êvarê min piraniya kurdên wira nas kirin, û sê rojan ez û xanima xwe li wir man, em hema bêje bi komê ra nediçûne gerê û her bi kurdên me ra digerîyan.
Roja, ku emê ji Bratîslavîyayê biçûne Pragê, serokê Komelê doktor Xelîl Îbrahîm hejmara têlêfona kurdekî Pragê ser kaxez nivîsî, da min û got, ku ez ji navê wî jê ra têlêfon bikim, eger firsend hebe, wî bibînim.

Me xatirê xwe ji kurdên Bratîslavîyayê xwest, em hatne Pragê, min kaxeza heval derxist, ku navê wî camêrî û têlêfona wî bizanibim, ku jê ra têlê xim.
Ser kaxez navê wî camêrî bû: Ebdurehman Qasimlo

Min jî digot qey hevalekî wek wan e.Bi wê fikirê min jê ra têlê xist. Xanimekê hilda û navê xwe da: Hêlên.

Wê bi soranî bersîva min da, lê gava ji min pê hesîya ku ez ji Sovyetê me û kurmancî dipeyîvim, bersîva min kurmancî da û got, ku mixabin Ebdurehman Qasimlo niha ne li mal e, lê hema hat wê jê ra bêje. Ji ber ku li Pragê jî em li xaniyê xwendkaran diman û têlêfona me tunebû, min navnîşana xanî û hejmara odeya me dayê.

»»» Doma R:8

Nerîna Lîderan



Barzanî: " Ew serdem derbaz bû ku bi zimanê gefê li dijî gelê Kurd bisekinin".



Trump: "Trump: Rejîma Îranê lihevkirina etomî wekî xwe cîbicî nake".




Nîkî Hîlî**:** "Emê rêz ji daxwazên xelkê Kurdistanê bigrinstanê".



Mihemed Hacî Mehmûd: "Îran û Tirkiye nikarin ji 5 mehan zêdetir deriyan bigrin".

Dr. Qasimlo şehîd kirin, lê nav û rêbaza wî tu carî namirin

Komara Îslamî ji rêya hinek ji hevalan ve pêşniyaza gotûbêjan bo çareseriya pirsa Kurd di Îranê de dide PDK Îranê . Komara Îslamî daxwaz kiribû ku ev rûniştin bi tewahî veşartî û nihênî be, û tevî şexsê Dr. Qasimlo jî be.



Gera yekem a rûniştinan di roja yekemîn a sala 1989'an de bi berhevbûna Mam Celal sekreterê giştî ê YNK'ê û li jêr çavdêriya endam û alîgirên YNK'e li Utrîşê û herwisa bi beşdariya Ehmed bin Bila serkomarê pêşîn ê Elcezayirê li Viyenê pêk têt.

Vê carê nûnerên rejîmê (ku wisa dîhare rewşê ji bo cîbicîkirina pîlanêt xwe baş nabînin) daxwazê dikin ku PDK Îranê pêşniyazên xwe bo çareseriya pirsa Kurd bas bike, da ku ew binivîsin û bidne navendê, bona vê çendê ku berpirs bîr û raya xwe li ser wan pêşniyaran eşkere bikin.

Dr. Qasimlo jî bi hûrî hemû boçûnên PDKÎ ji wan re şirove dike, û pêşniyazên hizbê didane ber destê wan, û ev gera gotûbêjê bi vê çendê bi dawî tê.

Ciyê heyrîmanê eva ye, Komara Îslamî ku hinde pê li ser veşartî bûna gotûbêjan dadigirt, ji rêyên curbicur ve belav dikir ku gotûbêje hebûye û nûnerên PDK Îranê û dewletê li Utrîşê hevdîtin pêk anîne.

Lê hevçax wisa nîşan dida ku eva YNK ye ku nûçeya gotûbêjan belav kiriye, lewma nabe YNK di gotûbêjeke nepenî de berhev be.

Di buhara sala 1368 (1989)'an de şehîd Dr. Şerefkendî seferek bo derveyî welat kir. Dema ku Komara Îslamî daxwazê dike ku qonaxa duyemîn a gotûbêjan dest pê bike, Deftera Siyasî dibêje çimku niha Dr. Şerefkendî li derveyî welat e bila qonaxa duyem a gotûbêjan bi wî re bê kirin. Lê Komara Îslamî ku bixwe du terorîst şandibûne ser maseya gotûbêjê, vê pêşniyarê ret dike, û radigehîne ku tevî şexsê D.r Qasimlo nebe, gotûbêjan nake.

Mixabin bo bextreşiya Kurdan, çi yek ji vanan Dr. Qasimlo hişyar nakin, û bala wî bo aliyê pîlana rijîmê bo jinavbirina wî ranakêşin.

Bi vî awayî roja 11.07.1989'an Dr. Qasimlo diçe Viyenê û digel terorîstên Komara Îslamî yektir dibînin, û bo tewawkirina gotûbêjan qerarê didanên da ku roja paştir her li wir yektir bibînin.

Roja 13.07.1989'an mixabin terorîstên rejîma Îranê dikarin vê pîlana xwe ya gemar bi awayekî necamêrane cîbicî bikin.

Terorîstên rejîmê kî bûn:

Hacî Mustefewî (naskirî bi "Cewadî" yan "Lacewerdî"), endamê payebilind yê dezgeha ewlekarî û tenahiya Îranê

Emîr Mensûr Bozorgiyan, îskort û parêzerê fermî yê Sehrarûdî
Mihemed Ce`efer Sehrarûdî: ku yek ji fermandeyên Spaha Pasdaran bûye, û niha jî serokê ofîsa Larîcanî di meclisa Îranê de ye, ku pêştir cihgirê beşa ewlehiya navxweyî ya Konseya Bilind ya Ewlehiya Neteweyî Bûye.herwisa yek ji endamên tîma gotûbêjkar a pirsa navikî ya Îranê jî bûye. Navbirî serbarê vê ku di dema terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî de bi birîndarî hate girtin, lê di cihê girtin û lêpirsînê, ew derman kirin û li ber berjewendiyên aborî navbirî teslîmî edaletê nekirin û bi ew qasê rêzgirtin ve şandin Tehranê, da ku xebera serkevtina di vê pîlanê de bigehîne erbabên xwe. Navbirî yek ji darêjerên pilana êrîşa bo ser binkeyên PDKÎ di Gelawêja sala 1375 (1996)`an de bûye.

Tîma zerbetê jî pêk hatibû ji Nasir Teqîpûr û Elîriza Esgerî, û Ehmedînijad berpirsê amadekirina çekan ji balyozxaneya Îranê.

Li gora gotina Pîtir Pîltz endamê rêberiya Partiya Kesk ya Nemsayê jî, dellaleke çek û teqemeniyan li Alman bi vî ragehandiye ku di sala 1988`an de, Ehmedînijad çek ji wî kirîne.

Jiyan û serpêhatiya şehîdên nû ên Rasanê di destanrêsiyên Qereseqel û Kosalanê de

Piştî salekê şopandina bi hûrî ya PDKÎ û dilsojên hizbê, di navçeyên Merîwan û Şinoyê, derket ku mixabin çend xortên bicerg ên PDKÎ di nava agirê kerb û kîna dijmin de canê xwe ê pak kirine goriyê riya pirr ji serweriya azadiya gel û nîştiman, û tevlî refên karwanê pirr ji şanazî ya şehîdên Kurdistanê bûne.




Şehîd Bêhzad Pîrotî:

-Kurê Husên Pîrotî ye, û sala 1373`an li bajarê Şinoyê de ji dayîk bûye.
-Sala 1388`an çalakiya xwe di nava Yekîtiya Lawên Demokrat ên Kurdistana Îranê de dest pê kiriye.
-Piştre bûye endamê Teşkîlata Eşkere ya PDKÎ
-Sala 1391`an de, bûye pêşmerge, û di Navenda 3 de karên hizbî kiriye.
-Di buhara sala 1395`an de digel tîmeke kadr û pêşmergeyan çûna navxwe a welat.
-Roja 2`ê Cozerdanê hêzên dijî gelî êrîşî ser gundê Qereseqelê dikin, û di encama şereke neberamber de şeş pêşmerge şehîd dibin, lê çarenûsa Bêhzad nediyar dibe. Piştî salekê şopandina bi hûrî eşkere bû ku navbirî şehîd bûye.



Şehîd Elî Mehmûdî (Şemal)

-Elî Mehmûdî naskirî bi Şemal kurê Kerîm sala 1366`an ji dayîk bûye.
-Sala 1389`an hatiye nava refên pêşmergeyên PDKÎ.
-Di Komîsyona Perwerdehiyê de kar kiriye
-Heyamekê jî navbirî wekî serpel di vê komîsyonê de kar kiriye, û di beşa tedarokatê de jî xebitiye.
-Piştre tevlî hêza Taybet a Çiya bûye, û di beşa tedarokatê de kar kiriye, û bi dilsojiyeke bêmînak ve, kar û xebata xwe domandiye.
-Di sala 1394`an de, di dewreya siyasî ya destpêkî ya kadriyê de beşdarî kiriye, û bi serkevtin ve ew dewre bi dawî aniye.
-Sala 1395`an çû navxwe a welat, lê roja 2`ê Cozerdanê hêzên dijîgelî êrîşî ser gundê Qereseqelê dikin, û di encama şerekî neberamber de, şeş pêşmerge şehîd dibin, lê çarenûsa Şemal nediyar dibe. Piştî salekê şopandina bi hûrî eşkere bû ku navbirî şehîd bûye.





Şehîd Mêhdî Şêxî:

-Mêhdî Şêxî kurê Hemexan, sala 1338`an di gundê Tewrîwer a navçeya Jawer ya Sinê de ji dayîk bûye.

-Di şerê sê mehî a navçeya Sinê de beşdarî kiriye.
-Sala 1358`an tevlî refa pêşmergeyên PDKÎ bûye, û di hêza Şerîfzade de hatiye organîzekirin.
-Di her du şerên newroza 1358`an û buhara bixwîn a Sinê de çalakane beşdarî kiriye.
-Di gellek şeran de beşdarî kiriye, û berpirsayetiyên wekî Serpel, cihgirê pel, serdeste û serlikiyê hebûne.
-Sala 1381`an pileya kadrê nizamî wergirtiye.
-çendîn xelatên rêzgirtinê wergirtine.
-sala 1394`an bo karê hizbî diçe navx-

»»» Doma R:6

Piştî du demjimêran (se`etan) Ebdurehman Qasimlo û Hêlêna xanim hatine mêvaniya me.

Min texmîn kir, ku evana ne wek hevalên di çaxê me ra nin, û rengê Ewropiyan zêde li wan dikeve, û merivne maqûl in.
Em hinekî bi otomobîla wan ya Fîata Polonîya di nav bajêr da gerîyan, em pê hesîyan, ku herdu jî mamostayê Unîvêrsîtêtê ne. Rojtira dinê em bûne mêvanê mala wan.

Li wir E. Qasimlo pirtûka xwe ya “Kurd û Kurdistan” ya bi soranî û tebaxeke kevinare ya bi destan neqişandî (ew heta niha jî di odeya me da, li cîkî ber çavan e) pêşkêşî me kir, û piştî ger û hevdîtina sê rojan, me xatirê xwe ji hev xwast, bi barek hesret di dilê me da, berê xwe da welatê xwe – Ermenîstanê.

Ji ber ku em sê rojan ser hev bi hev ra bûn, min wisa texmîn kir, ku wana jî ji me hiz kir.

Em hatine Rewanê, min derheqa rasthatina xwe û E. Qasimlo û xanima wî da ji hemûyan ra got, di nav wan da ji karmendên rojnameya “Rya teze” jî.

Wan jî got: kê zane ew kê bûne? Min wî çaxî nizanibû, ku ew Qasimloyê Mezin e, ku piştî Pragê bi neferên malê va cîguhêzî Fransîyayê bûne, ku sêkrêtarê sereke yê PDK Îranê ye, ku Parîs hîştiye, û ji bo gelê xwe ketiye çiyayên Kurdistanê, ku li rex pêşmergeyên xwe yên qehreman be.

Ne kurdên Çêkoslovakîyayê, ne jî wana bi xwe derheqa siyasetmedariya Qasimloyê mezin da, tu tişt ji me ra negot.

Belkî jî difikirîn: Kurd in, ser çavên me hatine, lê kê zane, belkî ne ji bo xêrê hatine, belkî hinekan ew şandine bal me. Em paşê, sala 1979`an serva çûn, ku em rastî kê hatine, gava hemû rojnameyên Sovyeta berê yên bi nav û deng derheqa şorişa Îranê û berxwedan û mêrxasîya kurdan ya bi serokatîya Ebdurehman Qasimlo da dinivîsîn.

Ew înformasyon ji rojnameya “Riya teze” ra jî dihat şandin û ji ber ku di rûsî da herfên E û Q tunene, bi rûsî wek A. Kasîmlo dihate nivîsandin.

Li wir kete bîra xebatkarên rojnamê, ku min berî 4 salan behsa wî camêrî ji wan ra kirîye û navê wî rast nivîsandin – E. Qasimlo.

Sala 1989`an bû.

Ez, xanima xwe û herdu keçên xwe ji Rewanê li trênê siwar bûn û me berê xwe da Moskowayê, bona çend rojan serhêsa bin û kêfa xwe bikin.

Li ser sînorê Gurcistanê Abxazîyayê trêna me çend sehetan sekinî. Ji me ra gotin, ku di navbera gurcan û abxazan da şer derketîye, em dibe çend sehetan, heta çend rojan jî li vir bin, heta şer dibetile.

Rojtira dinê ez ji betalîyê çûm bajêr bona rojnameyan bikirim, haj ji hal û wextê dinyayê hebim.

Di rojnameya “Îzvêstîya” da min xwend, ku serekê kurdên Kurdistana Îranê Ebdurehman Qasimlo bi destê çeteyan li Austrîyayê hatiye kuştin.


Piştî rojekê ji me ra gotin, ku trêna me ji dest şerê berdewam nikare berê xwe bide Moskowayê, û gerekê vegere Rewanê. Em vegeriyan.

Di rê da ez difikirîm: Hêzeke xurt û ne dîyar biryar kiriye û dibêje, ku ne wextê kêfê ye, hûn gerekê vegerin mala xwe…

Di wêne da: Qasimlo di sala 1950`î da, dema li Pragê xwendkar bû, wêneyê xwe bi du keçan ra girtîye, ku di paşdemê da, a ser milê çepê bû, xanima wî û hevala wî a jîyana evînî û sîyasî bû.

Çavkanî: Riataza

we a welat, û bi dilsojî û fedakariyeke zaf ve erkên xwe bi cî digehîne û piştî nêzî du mehan vedigere mal.
-Sala 1395`an dîsan tîmeke pêşmergeyan dibe navxwe ya welat, lê rejîm pê dihese û êrîşî ser wan dike.
-Roja 5`ê Pûşperêli nêzî gundê “Dû Rû” li quntara çiyayê Kosalan, di roja yekem a şer de 2 pêşmerge bi navên Şaxewan Mînberî û Şoreş Mînberî şehîd dibin.
-Di roja duyê ya şer de, pêşmergeyekî din bi navê Mam Ekber şehîd dibe, û şehîd Mêhdî û pênc hevalên wî ji hevalên din vediqetin, û çarenûsa wan nediyar dibe.
-Piştî salekê şopandina bi hûrî ya PDKÎ û dilsojên hizbê, derket ku mixabin ew jî tevlî refên karwanê pirr ji şanazî ya şehîdên Kurdistanê bûye.



Şehîd Berzan Husênî:


-Kurê Osman e, û ji dayîkbûyê sala 1356`an e, û li Belebzan a ser bi bajarê Pawe ji dayîk bûye.

-Sala 1380`î diçe Ewropayê û pênc salan li wir dimîne.
-Li wir dibe endamê Teşkîlata Eşkere ya PDKÎ.
-Sala 1386`an vedigere Kurdistanê, û dibe pêşmerge.
-Piştre dibe kadr û bi dilsojiyeke bêhempa ve karê xwe ê hizbî bi rê ve dibe.
-Di dawî konferansa Navenda 1 de, dibe endamê vê navendê.
-Di sala 1394`an de diçe navçeya Seqizê, û piştî nêzî du mehan bi serkevtin ve vedigere.
-Sala 1395`an dîsan diçe navxwe ya welat, lê mixabin rejîm êrîşê ser wan dike, û ew û çend hevalên xwe, bêserûşûn dibin. Piştî salekê eşkere dibe ku ew tevlî şehîdên hizb û gel bûye.



Şehîd Ruhullah Heyderî:

-Navbirî kurê Mihemed, ji dayîkbûyê sala 1348`an , ji gundê Degag a navçeya Şamyan a ser bi şaristana Sewlawa ye.
-Sala 1370`î pêwendî bi Teşkîlaya Nihênî ve girtiye.
-Navbirî gellek caran wekî çavsaxê hêza pêşmerge, alîkariya tîmên pêşmergeyan kiriye.
-Navbirî gellek caran alîkariya malî ji bo PDKÎ kom kiriye, û du caran ji aliyê Îtila`atê ve hatiye girtin, û cara duyem di buhara sala 1393`an de bû ku hate girtin, û cezayê girtina dirêjheyam bi ser de hate sepandin. Navbirî bi danîna wesîqeyeke giran ya malî hate berdan, û bilez xwe gehande Herêma Kurdistan.
-Sala 1394`an digel tîmeke pêşmerheyan vegeriya navxwe ya welat.
-Sala 1395`an bi awayekî fermî wekî pêşmerge hate wergirtin, û digel tîmeke pêşmergeyan çû navxwe ya welat.
-Lê mixabin hêzê rejîmê bi hatina wan û cihê mana wan hesiya, û êrîşeke hovane kire ser wan. Di encama şer de, ew û çend hevalên xwe, ji hevalên din vediqetin, û çarenûsa wan heya salekê nediayr dibe. Lê piştî derbazbûna salekê bi ser vê bûyerê re, çi şûnpiyek ji wan nehate dîtin, û hate ragehandin ku ew şehîd bûne.





Şehîd Sahib Husênî:


-Şehîd Sahib kurê Ezîz sala 1367`an di gundê Helwan a Jaweroya Sineyê ji dayîk bûye.
-Sala 1389`an bûye pêşmerge û du salan li komîsyona Siyasî-Nizamî de kar kiriye.
-Piştre çûye navenda 1, û bi dilsojiyeke bêmînak ve kar kiriye.
-Sala 1394`an çûye Komîsyona Malî-Xedematî û di beşên curbicur ên vê komîsyonê de kar kiriye.

-Di çend dewreyên taybetî de beşdarî kiriye, û her bi vê sedemê ve, ji aliyê Komîsyona Siyasî-Nizamî ve ahtiye xelatkirin.
-Sala 1395`an digel hevalên xwe diçe kûrahiya navçeyê, û mixabin piştî şerekî neberamber bêserûşûn dibe. Lê piştî salekê şehîdbûna wî û hevalên wî tê ragehandin



Şehîd Efşar Sûre:

-Kurê Mehmûd e, û di sala 1366`an li gundê Tewrîwer a navçeya Jawero a Sineyê ji dayîk bûye.
-Şehîd Efşar sala 1389`an pêwendî bi teşkîlatê ve girtiye, û wekî endamekî nihênî kar kiriye.
-Sala 1391`an bûye pêşmerge û di komîsyona Siyasî-Nizamî de kar kiriye.
-Di dema şerê Kêleşînê de ji yekem pêşmergeyan dibe ku diçe çiya, û heya dema şehîdbûna xwe jî di Hêza Tyabet de wekî pêşmergeyekî dilsoj bi berpirsayetiya Sepelî kar dike.
-Sala 1395`an diçe navxwe ya welat, û mixabin di encama êrîşa hêzên rejîmê û şerê neberamber de, ku sê hevalên wî şehîd dibin, ew û pênc hevalên xwe ji tîmê vediqetin û heya salekê çarenûsa wan bi nezelalî dimîne.
-Lê piştî salekê şopandina çarenûsa wan, çi şûnpiyek ji wan xûya nake, û navbirî wekî şehîd tê ragehandin.





Şehîd Hîwa Qurbanî:

-Kurê Hesen e, di sala 1370`î de li Kamyaranê ji dayîk bûye.
-Di sala 1389`an de tevlî refên pêşmergeyên PDKÎ bûye.
-Di Komîsyona Perwerde de, di beşa tedarokatê de, kar kiriye.
- Herwis erka serpeliyê jî di hêza Parastinê de li stûyê wî bûye.
-Di çend dewreyên nizamî de beşdarî kiriye.
-ji aliyê Komîsyona Perwerdehiyê ve, bi nivîskî hatite xelatkirin.
-Sala 1395`an ku diçe navçeyê, mixabin di dema şerê neberamber ê digel hêzên tarîperest ên Cemaranê de, bêserûşûn dibe, û mixabin piştî derbazbûna salekê, PDKÎ şehîdbûna wî bi awayekî fermî radigehîne.

Behmen Qubadî bû endamê Akademiya Oscarê

Derhênerê navdar ê kurd Behmen Qubadî bûye endamê Akademiya Oscarê, ku akademiya herî mezin a taybetî ya sînemaya cîhanê ye.

Akademiya Huner û Zanistên Sînemayê di sala 1927ê de li Kalîforniya ya Amerîkayê hatiye damezrandin û her sal xelata akademîk a Oscarê pêşkeş dike.

Zêdetirî 6 hezar endamên vê akademiyê hene, ku kesên pisporên hunera heftemîn û di nava wan de 5 hezar û 800 kes endamê komîsyona dengdanê ne.

Akademiya Huner û Zanistên Sînemayê îsal li seranserê cîhanê bang li 800 sînemakarên nû kiriye da ku bibin endamê beşên cuda yên akademiyê.

Di nava van kesan de 9 sînemakarê îranî û herwiha derhênerê navdar ê kurd Behmen Qubadî jî heye. Herwiha derhênrên jin, Leyla Hatemî û Gulşîfte Ferahanî jî di vê komê de cîh digrin.



Behmen Qubadî di sala 1969ê de li bajarê Bane ya Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. fîlmên wî di festîvalên cvîhanî de gelek xelat wergirtine.Rudaw

Rezoyê Osê: Jiyanek di oxira ziman û peyva kurdî de

Nivîskar û şaîrê Kurd Rezoyê Osê sala 1950 li gundê Dekşûrî yê ser bi bajarê Qamişlo ji dayik bû.

Wî bi çend zimanên cuda zanibû, lê girîngiya herî mezin da zimanê kurdî û li ser xebitî.

Osê li ser kelepor û folklora kurdî jî nivîsand, û çend berhemên hêja li pey xwe hîştin. Ew di sala 2010 li bajarê Qamişlo jiyana xwe ji dest da û li gundê Dekşûrî hate veşartin.

Ebdilrezaqê Osê yan bi kurdî Rezo dareke herdem şîn bû di bexçeyê kultûr û edebiyata Rojavayê Kurdistanê de.

Rezo jiyana xwe gorî ziman û peyva kurdî kir. Dilê wî yê nazik ketibû zimanê dayika wî û êdî nikarîbû û ne jî dixwest ji qeyd û bendên wî rizgar bibe. Zimanê wî rizgarî û azadiya wî bû û dilê wî bi kurdî lêdida.

Rezo di hemû qadên çand û wêjeya kurdî de ked û xebateke bê westan kir, wek ku zanîbû dê demeke dirêj li vê dinyaya fanî nemîne û divê berhemên hêja li pey xwe bihêle. Lewma wî helbest, çîrok, rexne, rêziman, folklor û gelek tiştên din nivîsandin. Bi taybetî jî dilbera wî





ango zimanê kurdî ew bi şêrînî û bedewiya xwe sermest kiribû.

Rezo stûn bû û bi hibra xwîna xwe qada rewşenbîrî li Binxetê av dida. Ji ber derd û pirsgirêkên çanda kurdî, xemeke pir mezin dixwar û kedeke tehbnenas dida da kêmasî û valahiyên heyî tije bike, heta di dawî de kezeba wî kul bû û di nav qîr û hawarên nexweşiya giran û xedar de koça dawî kir. Li ser gora Rezo ev gotinên helbesteke wî hatine nivîsandin: “Li azmanê bilind îro, şevên tarî hejar im ez. Stêra min xuya nake, nema ron û zelal im ez.”

Lê da Rezo di gora xwe rehet raze, divê zimanê kurdî bê bipêşxistin û nivîsandin û xwendina bi kurdî di nav kurdên Rojava de hîn bêtir belav bibe, wê çaxê dê tirba Rezo fireh û tije ronahî bibe.

Ehmedê Huseynî bi navê Destên Rezoyê Osê wiha li ser wî dibêje: “Min ji te re digot: dabeze, jiyan li me dereng bûye. De peya be siwaro! Ez li wir bûm. Li Dekşûriyê, şevistan radestî şopa rêberan û radestî silavên me dibû. Li Amedê birc û keleh di giriyê me de dixeniqîn. Li Hewlêrê destên me di taya xatirxwestinê de pûç dibûn û li Qamişlokê, bi hezaran qublename di çavên me de diteqiyan.” Çavkanî: Rudaw

Zimanê Kurdî

Çar kes werin cem hev, û li ser van pirsan gotûbêjekê li pêş bixin:

Îşev mêvanên me tên, gelo ez çi xwarinê bikelînim?

Ger li malê tiştek kêm be, ez herim sûkê bikirim. Ka binêre bê çi kêm e?
Ez nizanim bê ezê çi bikelînim, tu dikarî fikrekî bidî min?
Tirşikeke bi goşt, girareke (sawareke têr rûn) û zeleteyeke wekî ya li gund çêke, ma ne bes e?

Gelo tu dikarî herî ji dikanê tiştina bikirî û bînî?
Ez nên jî bînim, yan tê tenûrê dadî?
Min hevîr kiriye, ezê tenûrê dadim. Ma nanê tenûrê ne xweştir e, ji yê sûkê?
Kê gotiye ku ne xweştir e! Sed taq xweştir e. Wekî din tu tiştekî dixwazî?
Na, tu vana bîne, mala te ave. Ha, dermanê firaxşuştinê jî ji bîr meke, qet nemaye.
Ser her du çavên min. Ez niha diçim û tevan tînim ber lingên te.
Kî hinek din girar/savar/tirşik/birinc/cacix/qedayif/ dixwaze?
Gelo tu dikarî taseke av/şûşeyeke çay/qedexeke dew/fîncaneke qehwe bidî min?
Gelo mastê we heye? Dilê min dibije mastî.

Dema vexwarina çay û qehweyê

Gulîstan: Tu dixwazî çayê vexwî yan qehweyekê bidim ser êgir.
Zozan: Ji kerema xwe re çayekê bide ser êgir, ezê çayê vexwim.
Nazê: Ê min dilê min dibije qehweyekê. Ez werim alîkariya te bikim?
Gulîstan: Na lê, ne hewce ye. Ezê niha çêkim û bînim. Hûn li sihbeta xwe binêrin. Qehwa te bila şêrîn be, tahl be?
Nazê: Ne şêrînê şêrîn û ne jî tahlê tahl, bila di navê de be û bila têrşîr be ji kerema te re.
Gulîstan: Ger şîr li malê mabe! Ka binêrim. Ger nemabe ezê kurik bişînim, wê vê gavê bîne.
Zozan: Çaya min jî bila tenik be.
Gulîstan: Ji xwe ezê di du çaydanan de çêkim, êdî tu li gora xwe dagire.
Zozan: De baş e, destê te sax be.

Gulîstan: De kerem kin, kî çawa dixwaze, li gorî xwe dagirin. Kulîçe, paste, biskuwît dilê we diçe çi bixwin. Qet fedî nekin.
Zozan: Wîî, ma em li cihekî xerîb in ku fedî bikin. Vir wekî mala me ye. Ne wilo ye xwişka Nazê?
Nazê: Belê yadê, qet em xwe xerîb nabînin. Kulîçeyên te sor bûne, ka binêrim bê tahma wan çawa ye?
Gulîstan: Min di tenûrê de çêkirine, ji ber wê tahma wan pir xweş e. Tu çawa diavêjî devê xwe ji ber xwe ve difiride.
Zozan: Erê wele, rast e. Pir xweş çêbûne.
Nazê: We kir ku dilê min jî bibijeyê. Ez jî yekê bixwim. Mmmm... Bi rastî jî ji yên min xweştir çêbûne. Te çi xistiye hundirê wê gidî. Ka ji min re jî bêje!
Gulîstan: Şîr, şekir, rûn, hêk, kuncî û hinek gijnîj!
Nazê: Tu çima nabêjî ev tahma gijnîjê ye, wilo xweş kiriye. Careke din ezê jî biceribînim.
Zozan: Ma xwişka Gulîstan rast e ku wê Derwêş û Xanimê hev berdin? Min tiştekî wilo bihîst!
Gulîstan: Wele li ber guhê min jî ket, lê ez yeqîn nakim. Ew ji xwe her serê du sê mehan heyheyeke wilo ji xwe derdixin û tişt ji wan dernakeve!

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- 9 tenûrên neh nan, her nanekê 9 kutilk li ser, her kutilkekê 9 pişîk li ser, her pişîkekê 9 têjik li ber. têjka çendin? (* 9 tenûr, 81 nan, 729 kutilk, 6561 pişîk, 59049 têjik)

- Refeka çûçka di firin. Çûçkeka dî li ser darê gutê: Hûn çend çûçk in? Êkê bersiva wê da û gutê: Em û hindî me, nîveka me û çarêka me ligel te dê bîne sed. Erê hemî çend çûçkin?
Hawkêşa cebriye: Me girtî jimara refa çûçka (S) e.
Loma: S+S+0.5S+0.25S+1=100, 2.75S+1=100, 2.75S=100-1=99
S=99/2.75= 36 (* Jimara wan teva (36) çûçikin.)

- Refeka teyra gute refeka teyrên dî: Heke êk ji we bête nav me, em dê sê car hindî we lêhêyin. Refa dî gutê: Na! Heke êk ji we bête nav me em dê hindî êk lêhêyin. Erê jimara her refekê çend bûn?
Bersiv: (* 3, 5)

- Bi pêstirê serkeftime ser kela Hewlêrê. Min pêpkên wê du du hijmartin êk di ma, sê sê hijmartin êk di ma, çar çar hijmartin êk di ma, pênc pênc hijmartin êk di ma, şeş şeş hijmartin her êk di ma.hijmara pêpka çendin?
Bersiv: (* 61, 121)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

Agirî

Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (306)

Wêneyên rêûresma 28.mîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî







